

Qisira Qedriya

Dayika min gelek tiştên bi bilxurê çêdibin ji cîranên xwe yên Elewî yên bi salên dirêj li mala hember jiyabûn ku nayên bîra min hîn bibû, dema dayika min li ser rabirdûyê dipeyivî tim qala vê yekê dikir. Bê ji ber çî bû vê carê dil kir ku li ser beşek cuda ya rabirdûya xwe hûr bibe û hêlek wê ya cuda derxe holê û got ku çêkirina qisirê ji hemû kesên wê heyamê ketine jîyana wê hîn bûye. Gava êdî fedî kiriye qisira pir jê hez dike ji jinên li dora xwe bixwaze biryar daye ku ew bi xwe çêbike.

Akarsu Demirkol

Qisira dayika min ku hemû kesên wê dixwin dibêjin qisira herî xweş a di jiyana xwe de xwarine, ji dema ez bîr dibim ve dixwim. A rast ez nizanim ev îdiaya jî rast e yan na ji ber ku nayê bîra min ku min qisira kesekî dinê xwariye yan na. Di zaroktîya xwe de dema min ji mêvanên dihatin mala me tiştên bi vî awayî dibihîstin ez dibêim min tu wate lê bar nedikir. Piştî ez ji dibistanê vedigerîyam “xwarinên rojê” weke qisir, weke borek ku ji ber hevdîtina wê rojê mabûn ji suprîzbûnên şêrîn wêdetir nedîçûn, ji ber wê jî ji min re tiştêkî pir nedigotin. A rasttir bi min re nedipeyivîn.

Dema ku min ji bo vê proja me ya berhevkirina tarîfên xwarinan weke çavkanî dayika xwe hilibijart her tişt ji bo min ji zû de hatibû guhertin. Piştî perwerdehîyek çar salan a dîrokê, min di dilê xwe de pê derdixist ku ji bo bîra civakî û dîroka çandî van “xwarinên rojan” û hemû tiştên dayika min ji dayika xwe û hemû kesên din hîn bibû ji “dîroka malbata me” ya tekane wêdetir, ewê karibe ji hemû kesên têkilîya wan li vê erdnîgarîyê bi çêkirina xwarinê- an jî bi xwarinê- re heye tiştinan bibêje. Dîsa jî pêrgî bi gelek tiştên min ê nekarîba ji pêş da bidîta re hatim. Di vê rêwîtiya bi hewesa di hundirê peywenda civakî û çandî de bîcîkirin û hînbûna çêkirina xwarinek-du xwarinan de têkilîya me ya dê-qîz xurt bû. Girîngîya ji hev hînbûna nifşan ku piştguhkirina wê pir pêkan e jî bi hişkî li ser çavê min ket.

Dema min tarîfa qisirê ji dayika xwe pirsî, min ji zû ve zanîbû ku bi gotina wê “Li Traqyayê qisir tunebû” û çêkirina qisirê piştî bi bavê min re zewicîye û barkirine Stembolê hînbûye. Dayika min gelek tiştên bi bilxurê çêdibin ji cîranên xwe yên Elewî yên bi salên dirêj li mala hember jiyabûn ku nayên bîra min hîn bibû, dema dayika min li ser rabirdûyê dipeyivî tim qala vê yekê dikir. Bê ji ber çî bû vê carê dil kir ku li ser beşek cuda ya rabirdûya xwe hûr bibe û hêlek wê ya cuda derxe holê û got ku çêkirina qisirê ji hemû kesên wê heyamê ketine jîyana wê hîn bûye. Gava êdî fedî kiriye qisira pir jê hez dike ji jinên li dora xwe bixwaze biryar daye ku ew bi xwe çêbike.

Her ku kesên nû dikevin jîyana dayika min ji tarîfa qisirê re jî nûkirin tîn. Xaltîka Saniye sindikê xwe pir distirê, Xaltîka Fatma jî weha jê hezdike. Li gorî dibêje ev awayekî Semsûrîyan e (A rast Xaltîka Saniye Edeneyî û Xaltîka Fatma jî Meletî ye lê kî zane). Dayika min jî ji bo ku qisira xwe li gor koma hevalên xwe yên nû *up-to-date* bihêle rêyeke weke sindikê nepixîye demekê bi pîvazê re pijandinê dîtîye. Dema ji min re tarîfê vedibêje tavilê anektodek bi qisirê re têkildar jî pê vedike. Di serdanek malbata jina pismamê min a berê ya Entebî de, dayika min dibîne ku qisirê bi dew re ji navê û weke şîvê dixwin. Ji bo dayika min a di jiyana

wê de çûna wê ya Enqerê jî cara ewil çend salan berê ye bi qisirê re welatê kesên qisirê çêdikin jî tê ser sifrê, her hal qisir erdnîgarîya Tirkîyê jî di serê wê de ava dike.

Dema vana vedigot ji aliyekî jî me pev re qisir çêkir. Ez ewqasî şaş mam ku ew çend hêsa ye. Bê ji ber çî bû dayika min tarîf tim weke ji bo mêvanan tê çêkirin vegot. Qey ev teyisandina xwarineke “berêvarî”, “vedizokî” û “jin”bûna wê ye. Berêvarî min sênîyek mezin a qisirê û du kevçî birin hêwanê, bi dayika xwe re me bi dilxweşî xwar. Di serî de dayika min ji ber xwarina pev re ji navê di ber xwe de da. Lê dema min got “Ma ne bavê min naxwe dayê, de ka em her du bixwin” yekser qanih bû. Dema me qisira xwe dixwar min hertim weke dayika min kêfeke veşartî distîne hîs kir, weke ku li ser qahrê hemû bavên dijminê qisirê ku di wê de tiştêkî biadan nabînin.

Dema li benda amadebûna sindik tê sekinandin hemû şênkayî têne hûrkirin. Piştî ev herduyana têne lihevexistin tiştên weke lîmon û biharatê lê têne zêdekirin. (Ji bo kesên weke min têkilîya wan zêde bi metbexê re tune ye: Pîvaza hişk di serî de dema sindik tê şilkirin tê avêtin, pîvaza şîn bi şênkayîyan re lê têne zêdekirin.) Malzemeyên mayî yên “fantezî” giş li gor tahma dev in.

Tarîfa dayika min a qisirê

1 qedeh sindik (ê ecînê dikare bê bikaranîn)

Li gor qiyasa dest bi ava kelandî tê şilkirin

Xwê

Qisir disekine (30-60 dq)

Pîvaza hişk (1 ne pir mezin) divê hûr hûr be

Pîvaza şîn (çarîkek gurzê)

Bexdenûs (çarîkek gurzê)

Tirşa îsotan (a tûj û şêrîn, divê ya malê be)

Biharat

îsota sorî hûr

îsota reş

simaq

cehter (kekîk)

pûjan

Xesa girover

Bacanên sor (ji bo şilkirinê û xemilandinê dikare bê bikaranîn)

Xiyar

Xes

Pûjana şîn

Tûzik

Roka

Pîjinda (li gor xwestinê)

Îsotên şîn ên zirav

Nîşe: Başbûna zeyt û tirşê pir girîng e

Hin anekdot û tuyoyên derbarê çêkirina qisirê

Ji Xaltîka Saniye: Pîvazê navêje nava sindikê nepixîye û neeciqîne.

Semsûrî sindik dikelînin. Xaltîka Saniye pir distrê. Xaltîka Fatma jî weha jê hezdike.

Dapîrên min paşê hînbûn. Dayika min jî li Stembolê hînbû. “Li Trakyayê qisir tune bû.”

Sîr li gor xwestinê ye. Divê li mêvan bê fikirandin.

Bandorek li hev civandinê ya qisirê heye.

Dayika min: “Heke ewê mêvanên te bînin tu dikarî ji êvar de şenkayîyan hûr bike û rake.”

Sindik zeytê dikşîne.

Dayika min: “Psîkolojîya wê keliyê jî pir girîng e.”